

T ê k o ş e r

Hejmar 41

1lon 1988



Revue trimestrielle kurde N° 41 Driemaandelijks Koerdisch blad

Têkoşer : Kovara Têkoşer, yekitiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljika
Navnîşan : rue Bonneels, 4 - 1030 Bruxelles
Navnîşana Postê : B. P. 33 - Zellik
Tel : 02/230.89.30
Buha : 50 F.B.
NO bankê : 426-3144071-85 - K.B. - Belgique
Berpirsiyar : M. Nezih Yalçın
Komita niviskariyê : Derwêş, Nezih, Pervin

N a v e r o k

Nijadkujî li Kurdistanê	Derwêş	3
Peymana Sêvr li Parlemanta Ewropa	Pervin	4
Rêzimana Kurdi (XIV). Tewandin	Celadet Bedir Xan û R. Lescot	8
Diroka Kurdistanê di Ansiklopêdiya Îslamê de (XIV). Ziman		12
Helbest : Sala teze	Amed	15
Mirina Bênavêki helebçe	Şahînê B. Sorekli	16
Nêçir (2)	Osman Sebri	18
Stran : Hacê-Hadj	Cemila Celil	21
Xebata me		22
Têkoşer'den haberler		

S o m m a i r e

Génocide au Kurdistan	Derwêş	3
Le Traité de Sèvres au Parlement Européen	Pervin	4
Grammaire kurde (XIV). La déclinaison	Dj. B. Khan et R. Lescot	8
Histoire du Kurdistan dans l'Encyclopédie de l'Islam (XIV). La langue		12
Poème : L'année nouvelle	Amed	15
Mort d'un inconnu de Halabdja	Şahînê B. Sorekli	16
La chasse chez les Kurdes (2)	Osman Sebri	18
Chanson : Hadjê-Hadj	Djemila Djelil	21
Nos activités trimestrielles		22

I n h o u d

Genocide in Koerdistan	Derwêş	3
Het Verdrag van Sèvres in het Europees Parlement	Pervin	4
Koerdische spraakkunst (XIV). de verbuiging	Khan en Lescot	8
Geschiedenis van Koerdistan in de Encyclopedie van de Islam (XIV). De taal		12
Poësie : Nieuwjaar	Amed	15
Dood van een onbekende in Halabdja	Şahînê B. Sorekli	16
De jacht bij de Koerden (2)	Osman Sebri	18
Lied : Hadjê-Hadj	Djemila Djelil	21
Onze driemaandelijke activiteiten		22

ISSN 0773-3887

Nijadkuji li Kurdistanê

Derwêş

Ev çend hefte ne ku rejîma Iraqê bi hemî hêza xwe li Kurdistana Başûr nijadkujîyê dike. Balafir, tank, top, napalm û bombên kimyayî bi dor 65.000 leşker re êriş bir ser Kurdistanê. Gund û bajar, jin, cuhan û pîr tev amancên van êrişan in.

Paş rawestana şerrê Iran û Iraqê, rejîma eva dawîn leşkerê xwe bi tevayî şand ser Kurda. Bi sed hezaran Kurd ber bi sinarên Tîrkiye û Iranê revin. Pîraniya wan jin, zarok û kal bûn.

Dewleta Tirk, di rojên pêşî de ne xwest ku karekî insani bike. Deriyên xwe li wan girtin. Lê paş demekê derî vekirin, rê da Kurdên bêçare. Bi hezaran kes li gund û bajarên Kurdan belav kirin. Her komê ji wan di bin kontrola leşkerê Tirk de li benda "çareke" nuh e. Bijîjkên Tirk bikaranîna bombên kimyayî inkar kir. Lê ew rejîm li hember hemî dinyayê inkar dike ku wê bombên kimyayî bikar anîne. Dewleta Tirk ji aliyê Iraqê girt. Xewna dewleta Tirk bi nijadkujîya Iraqê tê ci : Vê pîrsê û vî netewî bi her awayî ji dirokê rakin.


Di rêxistina Neteweyên Yekbûyî (UNO) de, dewletên, Tîrkiye û Iraqê hem inkar û hem red kir ku komisyoneke navnetewî here binêre gelo bombên kimyayî tên bikar anîn yan na. Ango dewleta Iraqê nijadkujîya Kurdên wê derê kiriye bernama xwe. Tîrkiye ji vî yekê

teqdir dike. Lê ne bitenê teqdir dike. Lê ne bitenê Tîrkiye, Lîga Erebi jî bi awakî vekirî aliyê Iraqê girt. Divê ku Kurd vî yekê bi tipên mezin di diroka xwe de binivîsin û tucar wê ji bir nekin.

Ewropa, welatên Sosyalîst û Amerika jî di protesto û gotarên xwe de dereng man. Sermiyên Komara Fransa vî nijadkujîyê mahkûm kir. Paş rojekê, Wezareta Karên Derve ya Amerika, û çend roj paş re Parlemanta Ewropa "dîlşewata xwe" pêşan da. Lê ew "dîlşewat" têr nake. Bi milyonan Kurd di bin

tehlîka neman û mayînê de ne. Dirok carcaran hin bûyerên xwe tîkariyê dike : Indian, Cihû, Ermenî û niha jî Kurd. Ev netew û "qedere" wan nêzîkî hev in.

Kar û erkê (wezîfe) me Kurdan divê ji binî bê guherîtin. Ew karê ku me ta niha kiriye divê diwartir bibe, hevkarîya me xurttir û gestir bibe. Slogan û mesîn têr nakin. Yan dijmîn me diqelîne û vî pîrsê ji dirokê radike, yan jî divê em bi awakî xwestir kar bikin, bi dijmîn re şerê diwartir bikin.-






Peymana Sêvr li Parlementa Ewropa

Pervin

Civîneke çapê

Di mêjuya (tarix) 1.7.88 de, Bin-Grûpa (sous-groupe) Alliance Libre Européenne, ku yek ji bin-grûpên Grûpa Arc-En-Ciel, li Parlementa Ewropa, ye û ku tê de 19 partiyên ku 7 welatên ewropî temsîl dikin hene, civîneke çapê li ser pirsên Kurdistan û Eritrê, li Parlementa Ewropa, li Brukselê, pêk ani.



Dêlva ku Têkoşer, weka hergav, bi awakî gîstî li ser pirsê Kurdistanê bipeyve, me pêş neyar kir ku em rêxistinên kurdî yên her çar perçeyên Kurdistanê û Enstîtuya Kurdî ya Parisê vexwînin (dawet bikin). Lê mixabin, ji van rêxistinan bitenê P.D.K. Iranê û Tevger hatin.

Pêşgotina Willy Kuypers

Berê ku nûnerên kurd û yê Eritrê li ser rewşa welatê xwe û amancên rêxistinên xwe bipeyivin, parlementerê beljîkî û endamê grûpa Alliance Libre Européenne, Willy Kuypers, amancên vê civîna gelek giring dan nasîn. Em li jêr metnê pêşgotina wî werdigerînin kurdî :

Ditina me ew bû ku em hin nûnerên Kurdistan û

Eritrê, li ser bingeha Peymana Neteweyên Yekbûyî (O.N.U.) ya 1966 li ser mafên aborî, civakî û çandî, bicivînin. Di bend 1 de meriv dikare bixwîne : "Hemî gel mafê wan ê çarenûsiyê heye; li gora vî mafî, ew bi serbestî yeke mukemmel destûra xwe ya rêzani (siyasî) dest nîşan didin (tesbîr dikin) û pêşveçûna xwe ya aborî, civakî û çandî bi serbestî dajon". Ev bingeh e. Temenê (Imr) vî mafî iro 22 sal e, û gava ku em li van 22 salan temase dikin, em ji xwe dipirsin çima ev her du gel hin serfiraz ne bûne. Nûçeyên van her du axan pir carê weka agirê qirşîkan digihêjin me : çirûskên kurd û pasê tutîst. Bombeyên bi napalm li Eritrê, êrişên bi çekên şimik li Halabca, me qurbanên wan ditin. Lê ez dikarim bala we bikîşînim ku piştî Halabca tutîst ne guherî û ku êrişên bi çekên şimik

hin ji dajon ?

Di lista gelên jîbirkirî de, Kurd û Eritreyî bê gûman cihên pêşin digirin; di lista gelên ku di bin barê şerr de xwe xwar kirine, ew, mixabin, eynî cihan digirin. Eger em ji nêzik de binêrin, emê bibînin ku ji çarîka sedsalekê şerr li Kurdistanê, şerr li Eritrê heye. Dawiya serrên kolonî qet aşitiyê ji van her du gelan re ne ani. Loma em dixwazin ku xebateke taybetî (xusûsî) ji bo van her du gelan di nav Parlementa Ewropa de çêkin û wan weka nîşe (misal) bi kar binin.


Bi rasti, ji bo Eritrê biryarek li Neteweyên Yekbûyî di 15.12.1952 de hati bû stendin. Eritrê ji kolonyalîzmê, eynî weka gelên din ên Afrika, derketiye. Ew, weka navçeyên din ên Afrika, di bin kolonyalîzma Italya de bûn.

Loma, ez vê pirsâ vekirî dipirsim : Cima ji bo wan mafê çarenûsiyê, ev mafê ku ji aliyê O.N.U. di 1952 de hat pejirandin (qebûl kirin), weka ji bo gelên din ên Afrika, ne hat dayîn ?

Nîşeke din : Kurdistan. Di 10.8.1920 de, Peymana Sêvr hat imza kirin. Bi rastî, ew ji bo imhakirina Imperatoriya Osmanî, ku piştî çend salan bi Peymana Lozan hat tasdiq kirin, çêbû. Di navbera O.N.U. û Tirkiya wê demê de, li ser awayekî serxwebûnê ji bo Kurdistanê lihevhatinek çêbû. Lê, ha vaye em iro, piştî 70 salan, dibinin ku tutişt ji vê serxwebûnê pêk ne hat. Bi ser de ji, me dit ku gelên din, weka Misr û Erebiştanê, vê serxwebûnê, bi saya vê Peymanê, stand. Em îcar vê pirsê dipirsin : **çima ev bingeha huqûqî ji bo Eritre û Kurdistanê ne hat tatbîq kirin ?** Di vê pirsê de, Ewropa divê ku berpirsiyariya xwe li ser xwe bistine. Em gelek dilxweş in ku ji bo Namibya ewê gotûbêjek (munaqêşe) dest pê bike : Ewê li ser serxwebûna Afrika Başûrê Rojava bê axaftin, û em ji bo vê yekê li çepikan dixin. Mafê çarenûsiyê ji bo hemî gelan derbas dibe. Ji bo Eritre û Kurdistanê, ji nuha û pê ve, emê li Parlemeta Ewropa bixebitin ji bo ku em li ser vê bingeha huqûqî ku ev her du gel stendine îsrar bikin. Em, endamên Alliance Libre Européenne, li Kagliyari, li Sardênîya civiyan. Ev Alliance ji nêzîkî 20 partiyên demokratîk ên fêdêralist pêk hatiye. Me di vê civînê de daxwaziya xwe ya destpêkirina

pêwendiyên muntazam û xurt bi rêxistinên xusk ên kertên (kit'a, continent) din re got. Di destpêkê de, gelek pêwendiyên me bi Amerika Latîni re hebûn, lê me dixwest ku em ji hevalên xwe yê kurd û eritreyî re pênşeyar bikin ku ew platforma ewropî bi kar binin û xwe bi awakî muntazam, weka rêxistinên rêzani yê rast di vê cihana ku her ku diçe piçûk dibe, pêşkes bikin. Ez li vê derê dixwazim paralêlekê çekim. Eger P.L.O. (Eniya Filistîni) kariye ewqas baş xwe li meydana navnatewî pêşkes bike û giraniya xwe tê de bide pejirandin (qebûl kirin), ev eynî pênşevê divê ku ji bo tevgerên din, weka Polîzaryo, tevgerên rizgariya Eritre û Kurdistanê mumkun be.

Ez dixwazim bala we bikişînim xaleke duyemîn : Tehlika ku tavil, di vê saetê de, van her du axan tehdîd dike. Eger em baş agahdar bin - dibe ku nuha em zanînen nuh bistinin - di vê saetê de, li Asmara hêlikopterên ku ji aliyê Fransa hatine dayîn amade ne ku çekên şimik, bê tehlike ji bo pilotan, bavêjin. Di vê deqqa ku em tê de bi rehetî li Parlemeta Ewropa, li Brukselê, rûnistine, êrişeke bi çekên şimik, ji Asmara, Eritreya ku ji şahidên biyani hatiye vala kirin tehdîd dike. Di hefteya wêbê de, li Strasbourg, emê 12 serokên hikûmetên welatên endamên Ewropa deynin ber berpirsiyariya wan, yan jî emê piştî mehekê ji nuh de vegerin vî cihî, lê tevi hemî çapa nivîskî û hwd., ji bo protestokirina bikaranîna çekên şimik li



Bölücü Belçikalı parlamenterden bir inci daha
Kuijpers: "Sevr canlandırılmalı"

Eritreya ku hemî rêxistinên mirovî yên Ewropa Rojhilati jê hatine derxistin. Kî van hêlikopterên ku li Asmara rawestiyane dane? Eger ew ji Civaka Ewropî hatibin, divê ku em berpirsiyariya xwe bistinin.

Ezê eynî tiştî ji bo Kurdistanê bêjim. Me, bi Professor Heyndrickx re, berê demeke nêzik, êrişên bi çekên şimik li Halabca û derdorên wê, ev êrişên ku bê guman hatin îsbat kirin û di weşanan de hatin nîşan dan, ronî kirin. Piştî vê yekê, hefteke tenê derbas ne bû bê ku Iraq van êrişên bi çekên şimik diji Kurdistanê Iraqê dúbare (tekrar) bike. Ramana tevane (re'yê gîstî, opinion publique) li ku ye?

Em nêzîkî mehekê li bendê man. Nuha em dixwazin ku bi van her du tevgerên rizgariyê re bigihêjin avakirina platformekê, ji bo ku em balan bi awakî daimî bikîşin. Ji vira ne dûr dram çêdibin. Divê ku ev yek me xerik (mijûl) bike, ji bo ku di vê cihana ku piçûk dibe ew ciranên me yên yekemin in.

Daniel Johannes, ku li vira li kêleka min e, netewahiya (cinsiyet) beljîkî stendiye. Ew assîstanê min ê kati (muwaqqet), di A.C.N.C. de - rêxistineke ku weka parlemanteke cihani ya piçûk e û ku tê de 15% ji aqara cihanê û 11% ji gelheya cihanê heye - bû. Min jê xwestî bû ku ew bi taybetî di pirsên qiloça Afrika de alî min bike, û nemaze di pirsên penaber (multecî) û tevgerên rizgariyê li Afrika de. Di civîneke li Togo de, hebûna

Küstahlikta son perde Avrupa'da, Türkiye'yi 'bölme, dolapları

BRÜKSEL, (a.a.) - Avrupa Parlamentosu bünyesinde, Türkiye'yi parçalamak için Sevr Antlaşması'nı canlandırmak amacıyla çalışmalar yapıyor.

Kürt ve Ermenilerle ilgili karar tasarılarının hazırlayıcısı Belçikalı Willy Kuijpers'in öncülüğünde önceki gün Avrupa Parlamentosu'nun 51 nolu salonunda toplanan bir grup bölücü, bu konuda izlenecek yolu belirledi.

Toplantıdan sonra Anadolu Ajansı muhabirine görüşlerini açıklayan Willy Kuijpers, Kürtlerin özerklik istemelerini gerçekleştirmek için Sevr Antlaşması'nı ye-

• Avrupa Parlamentosu'nda bir grup bölücüyle toplantı yapan Türk düşmanı Belçikalı parlamenter Willy Kuijpers, Sevr Antlaşması'nın canlandırılması amacıyla, izleyecekleri yeni "şer yolları"ni belirledi.

Sevr, nedir?

OSMANLI Devleti'nin, Birinci Dünya Savaşı'nın ardından 10 Ağustos 1920'de, İtilaf Devletleri (İngiltere, Fransa ve İtalya) ile Fransa'nın Sevr kasabasında imzalanan bu antlaşma, Türklerin bütün egemenlik haklarını alan hükümler getiriyordu. İtilaf Devletleri ve onlarla birlikte hareket eden Yunanistan, Türkiye topraklarının önemli bölümünü, bu antlaşmaya dayanarak işgal ettiler. Antlaşma, Doğu Anadolu'da bir Ermenistan devleti kurulmasını, Türk ordusunun terhis edilmesini de içeriyordu.

Johannes ji aliyê delegasyona Etyopya ku got ku Eritreyeyekî bi netewahiya beljîkî nikare besdari vê civînê bibe hat protesto kirin. Em neçar (mecbûr) bûn ku polisê dewleta Togo bikîşin, û jî ji bo Daniel ewqas dijwar bû ku ew neçar bû ku welêt berde. Hûn hemî dizanin em çiqas diji "apartheid" in. Lê ez îcar dixwazim ku rejîma apartheid dirêj bikim gelek dewletên din.

Di dawiyê de, ez dixwazim ku li ser awayên cihê yên guvastînê (tazyîq), ku li vira, li Ewropa, li ser tevgerên rizgariyê yên cihê tîn kirin bipeyîvin. Berê mehekê malên hin kesan hatin teftîş kirin, bi behana ku ew dibe ku terrorist bin. Erkê (wacib) me, hemî kesên ku li vira ne, ew e ku em du pirsan bipirsin. Pirsê yekemîn: Rêzana Ewropa Rojavayî, nemaze li Beljîka, li ser tevgerên rizgariyê ku hatine pejî-

randin, ku sekretarya wan li vira heye û ku ji zû de ji aliyê destelatan (otorîte) hatine nasin, ewê çawa be? Emê karibin mêvaniya wan weka berê bikin? Pirsê duyemîn: Divê ku em ittîhamên ku li ser van kesan, bi riya berpirsiyariya min, dibin bipejîrinin? (Ji bo ku W. Kuypers ji salan de, bi awakî gelek vekirî gelên bindest li hemî cihanê diparêze, ew ji aliyê hinan bi parastina terorîstên bask û kurd hat ittîham kirin).

Ez dikarim nuha, piştî meheke libendabûnê - me xwest ku em mehekê ferzendê bidin destelata huqûqî - bêjim ku emê ittîhamên weha bibin ber dadgehê (mehkeme) û ku pirsên weha nema dikarin çêbibin.

Ha vaye, hevalên hêja, tiştên ku min, weka pêsgotin, xwest bêjim. Ez pêşneyar dikim ku nûnerên kurd berê

bipeyivin, û paşê yê Eritrê, ku ew - her yek ji bo navçeya xwe - rewşa îroyîn bi awakî nêrbarî (konkrêt) wafî bikin û ku hûn di dawiyê de karibin hemî pîrsên ku hûn dixwazin ji wan bipirsin.

Em ji nuha de îlan dikin ku emê berê dawîya salê heyeteke anketê, ku ewê ji parlementerên ewropî û rojnamevanan pêk bê, bişînin van her du navçeyan. Em hêvî dikin ku bi vî awayî em gelek zanînen destkewt (bîfeyde) berhev bikin.

Encam

Piştî axaftin, pîrs û bersivan, W. Kuypers bi vî awayî civînê qedand :

Em bi kurtî çar xalên vê rasthatinê dibêjin :

1. Destnîşandana xebatekê li ber 12 **serokên dewletên Cîvaka Ewropî**, ji bo ku em wan vexwinin ku ew **berpirsiyariya xwe** di nav hevkariya Cîvaka Aborî ya Ewropî û A.C.S. de, di tevayiya **dosya bazarganiya çekan**, ku di rojên dawîn de hat vekirin de û di sûcê dewletên cihê di vê babetê de di dema Irangate de, bistînin.

2. Em şandina **delegasyoneke navnetewî ya O.N.U. bo Kurdistan û Eritrê**, ji bo pîşkîna (muayene) tehdîdên **çekên şîmîk** ku bikaranîna wan bi awakî geş li civîna gîştî ya O.N.U. hat mahkûm kirin,

dixwazin.

3. Tevî Alliance Libre Européenne, em **platformekê ji hemî tevgerên rizgariyê yê demokratîk, ku li ser bingeha fêdêralîzmeke rast xebatê dikin, pêşkeş dikin**. Ev tevger, weka nîşe, tevgera rizgariya Eritrê, eniyên nîstîmanî yê kurdî, Polizaryo, tevgerên cihê yê Amerika Latîni ne. Em **dixwazin ku bi van tevgeran re xebateke fermî (resmî) bikin**, û ew dikarin bawer bibin ku parlementerên Alliance Libre Européenne ewê bibin parlementerên wan ên ku ewê gotinên wan bidin gihajtin, ev tevgerên ku mafê wan ê peyve ewqas kêmtir e.

4. Em **delegasyonan ji bo Kurdistan û Eritrê**, ku ji parlementer û rojnamevanan pêk tên, amade dikin.



Rêzimana Kurdî

(Zaravê Kurmancî)

- XIV -

Mir Celadet Bedir Xan û Roger Lescot (*)

V. Tewandin

Tewandina nav di rewşa binavkirî de

111. Di kurdî de, nav û, bi awakî gîstî, hemî gotinên ku weka nav bi kar tên: Sere-nav "navên kesan", jimar-nav, pîranîya pronavan "zemîr" û hin rengdêr "sîfet" (weka rengdêrên pêşker), tên tewandin.

Tewandina kurdî sê awayên wê hene: Awayê kirdeyî, awayê têrkerî û awayê bangî.

Emê di vi pişki (fesi) de, li tewandina nav di rewşên binavkirî û nebinavkirî de hûr binêrin. Tewandina pronav û rengdêrên guhêrbar ewê li dûrtir bê pêşan dan.

Tewandina nav di rewşa binavkirî de

112. Navên kurdî bi paşdanîna pêşkerên ku li gora her awayî ava dibin tên tewandin. Ev pêşkerên awayî ji bo nêr û mê diguherin, lê ew ji bo gelemjara her

du zayendan (cîns) weka hev in.

113. Awayê kirdeyî. Di awayê kirdeyî de, navê binavkirî teşeya (sîkî) xwe ya mutlaq dihêle, zayend û jimar wî çî be bila bibe.

a) Nêrê yekejmar :

Hesp hat
Mirov dixwe

b) Mêya yekejmar :

Mehîn dibeze
Dotmam dikene

c) Gelemjara her du zayendan :

Hesp hatin
Mirov dixwin
Mehîn dibezin. Dotmam dikenin

Nîşank. Di nîseyên jorîn

de, pevhatina (accord) lêker bi kirdeya xwe re ye ku dihêle ku meriv jimarê nav nas bike.

114. Awayê têrkerî. Ev awayê hemî gotinên ku tên tewandin e, dema ku ew erkê (wezîfe) têrker bikin, ango ji aliyê lêkerekê yan navekî, yan daçekekê, di mercên (sert) ku ewê li

1

NÛSERÎ ÇIYA

dûrtir bân dest nişan dan.

Pêşkerên awayî yê nî awayê
têkerî ev in :

a) Nêrê yekejmar : -ê.

Ez hespî dibinim.
Ez mirovî dibinim.

b) Mêya yekejmar : -ê.

Ez mehinê dibinim.
Ez dotmamê dibinim.

c) Gelejmarê her du za-
yendan : -an.

Ez hespan dibinim.
Ez mirovan dibinim. Ez
mehinan dibinim.
Ez dotmaman dibinim.

Nîşank. Di peyva rojî
de, n'ya pareka -an a
gelejmar pirçar hunda
dibe. Wê gavê em van
teşeyan dibînin : Hespera,
mirova, mehîna, dotma-
ma, dêlva hespan, miro-
van û hwd.

115. Xwarkirina taybetî
(xusûsî) ya di navên nêr ku
a yan e destîn de. Ev gotin
dikarin, dema ku ew yeke-
jmar bimin, awayê xwe yê
têkerî bi xwarkirina deng-
dêra xwe a yan e bi ê ava
bikin, dêlva ku rêzika (qaide)
gîştî ya ku di bend 114 de
hatiye nîşan dan tatbîq bikin.
Bi vî awayî, hesp û aş dibin
hêsp (dêlva hespî) û êş
(dêlva aşî). Nîşe :

Ez hêsp dibinim dêlva :
ez hespî dibinim.

Ez ji êş tîm dêlva :
ez ji aşî tîm.

Gotinên weka : Ga, xani,

ba, çiya, kevir, kew, Bozan,
Xabûr û hwd. dikevin vê tofê
(kom).

Dema ku gotinek tê de,
di eynî zemanî de, a û e
hebin, yan du caran yek ji
wan hebe, hergav ewa ku
di rata (cih) duyemîn de
ye xwarkirinê distîne. Bi
vî awayî :

Ezman : ezmên.
Welat : welêt.
Bajar : bajêr.
Beran : berên, û hwd.

Sazkirina awayê têkerî bi
xwarkirina dengdêrên a yan
e nema tê pejirandin dema
ku li pêşîya gotina ku ew tê
de ne rengdêreke pêşker,
nebinavkirî, pîrkerî yan ji-
marin bê. Wê gavê, divê ku
em bêjin :

Tu kîjan hespî dixwazî ? ne
tu kîjan hêsp dixwazî ?

Ez ji vî aşî tîm, ne
ez ji vî êş tîm.

Ez çel beranî dibinim, ne
ez çel berên dibinim, û hwd.

Nîşank. Bikaranîna
awayê têkerî yê nêrê
yekejmar ber bi hunda-

S.BRAHIM

GULÎSTANA ZIMAN

سلسلە تەلیم اللغة کردیە

1

2594 k
1982 m

bûnê diçe : Ew, di hemî
peyvikan de, bitenê dema
ku li pêşîya gotin reng-
dêreke pêşker û hwd.
hebe (li benda jorîn bi-
nêre), bi awakî gelek ic-
barî bi kar tê.

Di vajayê wê de, ragihan-
dina pareka awayî -î bitenê
di peyvikên Rojhilatê de
(Botan û hwd.) bi awakî
mutlaq bi kar tê. Nîşe :

Ez hespî (mîrovî) dibinim.

Li herderên din,
bikaranîna awayê têkerî yê
nêrê yekejmar bitenê bi
xwarkirina dengdêrên a û e
bi ê dibe; gotinên ku tê de
tuyek ji wan nebe neguhertî
dimînin. Nîşe :

Ez hêsp dibinim. Lê : ez
mîrov dibinim.

Di dawiyê de, li gelek
navçeyan, heta tewandî-
na gotinên ku tê de a
yan e hene ji tê îhmal
kirin. Nîşe :

Ez hesp dibinim dêlva :
ez hespî (yan hêsp) dibinim.

Em bala xwe bidin ku

bikaranîna awayê têkerî li herder ji bo mêya yekejmar û gelejmar her du zayendan îbarî ye.

I 16. Gotinên bi -an. Gotinên ku bi -an diqedin di du tofan de vediqetin : a yekemîn gotinên ku tê de regezê (unsur) -an perçeke rast ji gotina rayî ye distîne. **Nîse :**

Baran, derman, garan (keriyê gayan), kevan, dran, Rewan (Erivan).

Hemi ev gotin awayê têkerî bi intizam ava dikin.

Tofa duyemin gotinên ku -an'a wan a dawîn bitenê pêşkera awayê têkerî yê gelejmar e dicivine. Ev gotin hema bitenê navên êlan, ku piricar weka têkerên destnîşandane bi kar tên, in.

Nîse : Cihê Botan (Bot), esîra Kikan (Kik), welatê Xerzan (Xerz).

Nîsank 1. Istisnayeke tenê, ku hatiye dîtin, a vê rêzikê gotina **Gulan** (meha gulan) ku awayê têkerî yê gelejmar e, lê ku pêşkera awayê têkerî yê yekejmar distîne, ye. **Nîse :**

Meha Gulanê. Nîvê Gulanê.

Piraniya van navên bi -an, nemaze navên êlan, mûnkun e ku pareka destnîşandane bistinin. **Nîse :**

Mirdêsanên Gawastî (gawa- stî : yên ku nema koçer in).

Berazanên Serhedan

Botaniya Jorîn

Nîsank II. Ji nav van gotinên bi -an, balkêş e ku meriv gotinên **xwalan** (xalan) û **apan** nîsan bide. A yekemîn ji xwal (xal) tê; rêzayê wê kombêj e û ji bo nîsandana merivekî ku bavê wî jineke biyanî stendiye, tevayiya zilamên ku ji êla rayê dê ne, bi kar tê. Bi vî awayî, evên dawîn weka merivên hev, eger girêdanên malbatî yên rast tu nebin jî, tên hesab kirin. Bi eynî awayî, apan (ji ap) ji bo hemî pismaman tê gotin. Meriv dibêje :

Xwalanên min.

Apanên min. Lê :

Xwalên min.

Apên min.

I 17. Awayê bangî. Pêskerên awayê bangî ev in :

a) **Nêrê yekejmar : -o.**

Mirovo, xorto.

b) **Mêya yekejmar : -ê.**

Dotmamê, xwişkê (xuşkê).

c) **Gelejmar her du zayendan : -ino.**

Mirovino, xortino. Dotmamino, xwişkino.


Awayê bangî dikare bi **banesânên lo**, ji bo nêrê yekejmar û ji bo gelejmar, **lê** ji bo mêya yekejmar, bê dest pê kirin. **Nîse :**

Lo xorto. Lê dotmamê.

Nîsank I. Awayê bangî yê gelejmar dikare bi alîkariya **banesana gelî** jî ava bibe. Eva dawîn tê pêşiya gotina ku wê gavê pêşkera awayê têkerî yê gelejmar distîne. **Nîse :**

Gelî mirovan (dêlva mirovino).

Gelî Kurdan (dêlva Kurdino).



Baneşana gelî ji gotina gel (ku daçeka digel "bi" jî dide) hatiye. Di hin peyvikên Başûr de, ev gotin bûye pasdanî û weka pêskera gelejmar bi kar tê.

Nîşank II. Piştî dúbare-bûna (tekrar) bikaranîna wan bi awayê bangî, hin nav heta di rewşa mutlaq de, pêskera vî awayî dihêlin. **Nîşe :**

Biro, Misto, Mişo, Soro, Pûrto, Rindo (serenav).

Kalo (merivê kal, pîr).

Rindê, Gulê, Bazê (serenavên jinan).

Em têbibînin ku çend serenavên zilaman carna pêskera awayê bangî ya nêr, û carna ya mê distînin. Gelek serenavên mê jî vê taybetiyê distînin. **Nîşe :**

Bûbo û Bûbê, Beso û Besê, Misto û Mistê (serenavên zilaman).

Xecê û Xeco, Bêzê û Bêzo (serenavên jinan).

Teşeyên nêr ên van navan, eger ên zilaman yan ên jinan bin, bitenê dema ku meriv bangî kesên ne resen (esil) dike tînin bi kar anîn; di vajayê wê de, teşeyên wan ên mê jî bo kesên ku ji zabûnê resen in dibin. Bi vî awayî, meriv ji kurê axakî re Bûbê, lê ji merivekî adî re Bûbo dibêje; Xecê ji keçeke resen û Xeco ji gun-diyekê re.

Nîşank III. Gotinên ku, weka yên ku me di nîşankên buhurî de gotin, hergav dawîneya -o ya awayê bangî distînin, di awayê têrkerî yê yekejmar de neguhêrbar in; bi rastî, tu gotin nikare ji pêskereke tenê ya awayî bêtir bistîne. Bi vî awayî meriv dibêje :

**Hespê Mişo (awayê têrkerî)
Keça kalo (awayê têrkerî).**

Awayê kirdeyî dikare bi rakirina dawîneya -o bê cihê kirin, û bi vî awayî gotin teşeya xwe ya pêşîn ji nuh de distîne. **Nîşe :**

119. Nexşeya biranînê

A- Nêr; nîşe : Mirov, hesp.

	Yekejmar	Gelejmar
Awayê kirdayî	Mirov Hesp	Mirov Hesp
Awayê têrkerî	Mirov Hesp yan hesp	Mirovan Hespan
Awayê bangî	Mirovo	Mirovino

B- Mê; nîşe : Dotmam

	Yekejmar	Gelejmar
Awayê kirdayî	Dotmam	Dotmam
Awayê têrkerî	Dotmamê	Dotmaman
Awayê bangî	Dotmamê	Dotmamino

Kal hat. Mîs çû.

Nîşank IV. Gotinên ku bi taybetî, di hemî awayan de, bi pêskera -o ya awayê bangî bi ka tnîşandanê bistînin.

Nîşe :

Purtowê Biro (Purto, kurê Biro).

Sorowê sêrwi (Soro, yê ji Şerwan).

118. Tu gotineke ku pare-keke destnîşandanê stendiye nikare pêskereke awayî bistîne. **Nîşe :**

**Ez hespê Soro dibînim.
Lê dotmama delal.**

Dûmahî heyê

Dîroka Kurdistanê di

- XIV -


V- Ziman

Teseyên (awa, şikl) cihê yên peyv, ku bîyanî ji wan re kurdî dibêjin, zimanekî tenê yê yekbûyî ava nakin. Di vajayê wê de, em dikarin bêjin ku zaravên kurdî yên cihê, ku gelek nêzîkî hev in û ku di eynî zemanî de ji zimanên îranî yên rojavayî yên hawsê (ciran) cihê ne, di sê tofên (kom) sereke de beş dibin. Cihêtiyên ku di navbera zaravan de hene, bi awakî giştî li gora mesafeta coxrafî ku wan vediqetîne ne, û ew dihêlin ku ev zarav ji aliyê yên din neyên

têgihajtin. Tofa bakurî hemî zaravên ku li Komara tirkî, Ermenistan û Azerbaycanê, li navçeya Mûsilê, li Iraqê (li Behdînan binêre) û li hin navçeyên dora wan tên peyivin û zaravên koloniyên kurdî li Xurasan û Tirkmenistanê ava dike. Hemî ev zarav navê wan kurmancî ye, û hemî gelheyên ku bi wan dipeyivin navê xwe dikin kurmanc. Li hundirê vê tofê, meriv dikare kurmanciyeke rojavayî û kurmanciyeke rojhilatî, ku her yek ji wan zimanekî bêjeyî (edebî) pêk anîye,


cihê bike. Tofa navendî ji zaravên ku li Erbil, Silêmanî û Kerkûkê, û li navçeyên nêzîkî Kurdistanê Iranê, Mahabad (Sawc Bûlak) û Sanandajê (Sine) tên peyivin ava bûye. Ev zarav bi awakî giştî navê wan kurdî ye, lê navê wan bi awakî giştî ji soranî ye, li gora navê miriya keyn a Soran. Zaravên Silêmanî û Sinê bi taybetî weka zimanên bêjeyî tên nasin. Zaravên din ên kurdî yên ku tofeke tevlihev, ku li navçeyên Başûr û Rojavaya soranî tên peyivin û ku di nav wan de dibe ku Kirmansahî yê giringtirin be, pêk tinin dikarin bi hev re têkevin nav tofeke başûrî. Xuya ye ku hin ji wan, weka lakkî, tevî zaravên ne kurdî yên hawsê (ciran) yên lûrî bûne. Di navbera tofên navendî û başûrî de, giraveke tevlihev, bi peyvikên ku li sino- ran tevlihev in, li navçeya Gûran pêk hatiye. Zaravîne din ên kurdî ji aliyê girseyên (kitle) tenha yên kurdî, ku li hemî Iranê belav bûne, tên peyivin.

Kurdiya bakurî ji aliyê damezrana xwe ya deng û teseyên (şikl, awa) gotinan ji zaravên din kevnartir



(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin; fransîzî-kurdî : Pervin-

Ansîklopêdiya Islamê de (·)



e. Meriv dikare jê têbigihêje ku pêşveçûna ku bêtir di zaravên Navend û Başûr de xuya dibe sedema wê pêwendiya wan a nêzîktir bi zimanên din (ên îranî) re, yan jî stendina bingeheke wan e. Ji derveyî wê, xuya ye ku kurdiya bakurî jî ketina erebî û nemaze ya triki re hinek bêtir vekirî ye. Kurdi jî berê bi **alfabeya erebî** ya hinek guhertî dihat nivîsin, û ev sistem hin jî li Iraq û Iranê bi kar tê; carna **alfabeya ermenî** jî hat bi kar anîn, û di demeke nuh de, sistemên nivîsinê ku li ser alfabeya latînî û kirilîk ava bûne, nemaze jî bo kurdiya bakurî, hatin ditin.

Di lista **dengên "iranî"** yên hemî **Kurdên bakur** de

ev hene : a l m, â ê î ô û, p t ç k, b c g, f s ş x, v z x, m n l r (xurt) r (gerandi), h u y. Piraniya zaravan **dengên "erebî"** q, h' û t s z ên stûr radigihînin wan. Li Bakurê Rojava, dibe ku di bin kartêkîrîneke (tesîr) qefqasî (ermenî), meriv cihêtiyeke din di navbera **dengên xurt** p', t', ç', k' û qels p, t, ç, k dibîne. Di besêke mezin a navçeya kurmanjî de, o û û bî û û u hatine guhertin. Di **kurdiya Navend û Başûr** de, cihêtiya ku di nav v û w de bû hunda bû jî bo ku cih bide w. Lê, cihêtiyeke nuh di navbera **l'ya ezmanî** û **l'ya sîvîk** de çêbû (lê eva dawîn li Erbilê r tê bi lêv kirin), û n li Silêmanî û di zaravên başûrtirîn de bûye

weka **tipeke dengî**. Bi awakî gîstî, **pêşveçûna dengî ya kurdi jî ya farîsî bêtir e**, nemaze di derbasbûna tipên girtî ber bi tipên lêvî de, weka **av/w** (farîsî : ab); **sev/w** (farîsî : sab). Gelek dengdarên diranî hunda bûn, weka : bira (farîsî : birader); dan, dain (farîsî : dadan); sipî (farîsî : safid); sa "seh" (farîsî : sag); çiya (farîsî : çakad). Dawîneyên rengdêrên lêkeran darîçav in, weka li Bakur : mirî; li Navend : mirdû; li Başûr : mirdig. Jindar li Navend dibe : zindû, zinû; li Başûr : zinig (farîsî zinda).

Kurdi ne bi pêşveçûneke tenê ya dirokî nîşankirî ye, lê civandina du guhertinên derengtir û xêzeke keynar dikarin zaravekî weka kurdi bidin nasîn :

1. -m-, -sm-, -xm > -v- (-w-). Nişe : **nav/w** (farîsî : nam); **çav/w** (farîsî : çasm); **to/v/w** (farîsî : tuxum).

2. x'ya îranî ya destpênek > k. Nişe : **kar "ker"** (farîsî : xar); **kani** (farîsî : xani); **kirin** (farîsî : xaridan).

3. ç'ya îranî > ç- (îranîyeke din ê rojavayî > ş). Nişe : **çûn** (farîsî : sudan).

Kurdi gelek pêşveçûnên wî yên dengî, tevî zaravên ne

farisî, hene. Nîşe : z:d, zan- (zanibe) (bî farisî : dan-); s:h, asik (pezko-vî) (farisî : ahû); z:j, jîn (farisî : zan); roj (farisî : rûz), lê pêşveçûnên wî yên din, **teví farisî**, hene. Nîşe : y- > c-, co (ceh-) (farisî : caw); hw- > xw-, **xwa, xo** (ruh, can) (farisî : **xwad, xud**); -rd- l-, **palew** (par-zûn kirin, dawerivandin) (farisî : palay).

Ev nêzîkbûnên zimani, eger em li wan li gora hin taybetiyên zimani binêrin, nîşan didin ku **rayê (esl) kurdi hawsêyê (ciran) nêzik, yan ê nêziktirin, ê farisî bû**. Nîşankên giring ku bidin zanin ku **rayê kurdi yê medi heye tu nene, li gel ku hat pêşneyar kirin ku navê kurmancî ji civandina Kurd û teşeyêke ku ji Mada "Med" hatiye pêk bûye**.

Taybetiyên teşeyên gotinan ên kevn ku di kurdiya Bakur de mane di cihêtiya awayan (awayê kir-deyi û têrkerî) û zayendan (nêr û mê) de, di nav û pronavan de û di sazkirineke taybetî di dema buhurî ya lêkerên sergerandî (yên ku têrker distinin) de (nîşe : ez hatim, lê min xewnek dit) xuya dibin.

Tewandin û zayend di kurdiya Başûr û teşeyên bêjeyî yên kurdiya navendî de hunda bûn. Di van zaravan de, **paşdaniyên pronavî**, ku di kurdiya Bakur de ne mane, bi awaki fireh **cihê awayan stend** (nîşe : min hatim, **xawek-im di "min xewnek dit"**). Di hin zaravên Navend de, qet nebe sazûna lêkerî pirr pêş ve çûye, **riha lêkerî**


carna du paşdaniyên kesîn, ku yek ji wan kesekî ku ne pirr girêdayî pirsê ye, weka **xaw-im pêwa diw-it** (min li ser te xewnek dit), distine. U **paşdaniya pronavî** jî, da -m -i -n -ê (ew "î", min "m") **bû -ê (li), -n (hûn)**. Em bala xwe bidin **kesê 3min ê pronavî -î, gelejmar -yan**, ku li hemberî farisî -ş ye.

Hemî zarav paşdaniyeke wan a nebinavkiri heye. Li Bakur : **-ek**; li Navend û Başûr : **-êk**. Lê **bitenê zaravên Navend û Başûr (teví gûrani) paşdaniya binavkiri -aka distinin**. Di hemî zaravan de, **"izafet"**, ku di bin teşeyên, **cihê de xuya dibe roleke**

"Bakur : kur-êt xwe (kurê di xwe) (kurên xwe), lê ev ne gelejmareke bi t ya weka yên iraniya rojhilatî, ossêti, sogdî û hwd. ye. Kurdiya navendî û başûrî, di vajayê zaravên Bakur de, di lêker de kesandineke nege-rakî (passif) ya giring, ku ji rayê dema nuha ya gerakî (aktif) ava bûye, pêk aniye. Nîşe : **kustin, kuj-**; li Navend : **kuzran, kuzrê-**; li Başûr : **kujyan, kujyê** (bê kustin).

çavkani

Lîsteke mukemmel a



giring, hem weka pronavekî **glrêkî û hem weka bitenê parekeke ragihandinê, dili-ze**. Nîşe : li Bakur : **xewnek-e xwes**; li Navend : **xawek-î xos**; li Bakur : **xewn-a min dit**; li Navend : **xawaka-y di-m**. Li Bakurê Rojhilatê, sazîya bi **"izafet"** a zaravên Bakur û Navend pareka **da, -d, -t**, nemaze di gelejmar de, ku dibe ku **rayê wê suryani be**, distine. Nîşe : li Navend (mukrî) : **pyaw-î da paşa** (peyayên "zilamên" paşa). Li

tevayîya lêgerîn û wasfên li ser kurdi **heta 1926** ji aliyê **Minorsky**, di gotara xwe ya EII (ku kevn bûye) de, hat dayîn. Emê wê bi çavkaniya bijarte ya **D. N. MacKenzie, Kurdish Dialect Studies - I, London 1960**, temam bikin. Lîsteyên temamtir, lê ne krîtîk, di **Z. S. Muasê-lyan, Bibliografiya po kurdovedeniv, Moskov 1963 û S. Van Rooy û K. Tamboer,**

ISK's Kurdish bibliography, Amsterdam 1968 de hene. Berhemên jêrîn hêsantir peyda dibin :

1. Dîrok : D. N. MacKenzie, The Origins of Kurdish, di TPhS 1961, 68-86 de.

2. Rêziman, lêgerînên zaravî : D. N. MacKenzie, Kurdish Dialect Studies-I; K. Kurdoêv (Qenatê Kurdo),

Grammatika kurdsko-go yazika (kurmandji), Moskov-Lenîngrad 1957; Celadet Bedir Xan û R. Lescot, Grammaire kurde (dialecte kurmandji), Paris 1970; C. Kh. Bakaev, Govor kurdov Turkmenii, Moskov 1962; nivîskar bixwe, Yazik Azerrbaydjan-skikh Kurdov, Moskov 1965.

3. Ferheng : A. Jaba û

F. Justi, Dictionnaire kurde-français, St-Petersbourg 1879; C. Kh. Bakaev, Kurdsko-Russkiy slovar', Moskov 1957; T. Wehbî û C. J. Edmonds, A Kurdish-English dictionary, Oxford 1966.

(D. N. MacKenzie)

Dûmahî heye

Helbest

Sala teze

Amed

Sala teze !
sala hezar nehse û heystê û heystan.
Nêzik dibi.
Wekîdinê, ji min dûr e
welatê min, Kurdistan.
sîngê te yî kal î gewr
hên ne deq e, ne şan.
Erê, Hêvanê mirovan
Hêy sala nû !
î şêrî e.
Tal dike rengemirovên gunehkar.
Mîna sala te a çûnî
Zarokên kurd,
Li ber bombên şîmîk çûnî.
Ker bûn ku dixwestin gelan bindest bikin.
Kertirîn ku hên dixwazin berdewam bikin.
Sala teze !
Sala bêguneh;
Sala heystê û heystan.
Xezala minê !
Wa melezine, lê !
Disa kelegirî û şîne.
Li welatê min, Kurdistan.
Sala nû, kihêla minê.
Navê te bikim çî ?
Heniya te nîşan bikim bi çî ?
Pêrçema te, mala minê !
Ne a şekirîye.

Biskên helbesta min,
- mala te yê jî -
Loma, ne a hûnandî ne.
Aska minê,
Mirûzan tal meke ku helbest a vekirîye.
Bibihise, bist milyon Kurd ji vî zimani a
bêparkirî ne.
Rewşa te ne xweş e.
Va helbesta min jî şkest.
De wa bixwine :
"sereftirîn gelin, gelên bindest".

Mirina Bênavêkî Helebçe

S.B.Sorekî

Civikan li ser darekê dixwendin û dengêkî weke mûzikeke xweş li dorhêlên darê belav dikirin. Çêlekê ji darê wê de li ser gihayê nû diçêriya, segekî ciwan ji çêlekê wê de dida lotikan û li her derê kulilkên bi rengên cuda serên xwe şermok ber bi jor hildidan. Keçeke sê salin, ya ku hê nû bi ser lingan ketibû ji deriyê xaniyekî li hêleke bajêr dihat der û ber bi bavê xwe diçû, ew yê ku di navbera darê û çêlekê de rûniştibû û bi ser xwe de diponiji.

Helebçe ketibû destên pêşmergan, têkoşerên ku bi xu û xwûna xwe ew azad kiribûn, lê serketina wan û rizgarkirina Helebçe di bin potinên pasdaran de brin bû bûn, serketin û azadiyek e bê dîlşadi.

Keçikê çar mehan bavê xwe neditibû, lê di sê rojan de dişa fêri bavbûna wî bû bû û nuha ber bi wî diçû.

Xurist ji bêtar û cengan mezintir e. Tevî serê Iran û Iraqê yê heşt salin, ew cenga ku li ser zeviyên Kurdistanê agir û şewat belav dikirin û merov ji erdê bapirên wan hildikişandin, tevî çemên hêstir û xwûnê ku ji hêla Kurdan de bi salan di hindir têkoşineke mêrxas de rêçikên xwe li her derê hiştibûn, ew têkoşina ku li dijî polat û bombeyên cihanê hê ji berdewam e, tevî hemî hovitiya merovan, erê tevî

hertisti, hê ji xuristê Kurdistan bi hatina biharê re dixemiland, Kurdistan hatiye çirrandin, ew xakê ku xwe-diyên wê hê ji nizanin çawa ji sasetiyan fêrî dersan bibin

Disa dengê firrokan hat. Gelo Miraj bûn, Mig bûn, Fantom bûn, gelo icar ji balafirgehên kijan hêlê bi firran ketibûn, gelo bombeyên kijan welatî, yan welatan di bin zikê wan de bûn, gelo pilotên wan ji çi netewê bûn, Faris bûn, Erebên Iraqê bûn, yên Misrê bûn, lê yên neteweyekê din bûn ?

Ziqezîqa çivikan bi carekê ve hat birrin, orinî bi çêlekê ket û kûzinî bi kûçik. Dûyekî gewr xwe li wan dorhêlan belav dikir. Keçik ket xar û kuxiya, bavê wê rabû, ber bi wê reviya, lê ling li ber hev geriyan, ew ji ket, kuxiya, lê dişan hêze xwe kir, rabû û reva xwe domand. Nefes li bavê keçê çik bû bû, gewriya wî dişewitî, singê wî teng bû bû û ji hêstirên sewata çavan ber xwe bi zor didit, lê kezeb sêrin e, xwe gihand dota

xwe û xwe avêt ser.

Civik ji ser çemelên darê ketibûn xar, seg li ser erdê vedigevizi, çêlekê li ser kêleka xwe can dida û ji asiman nema dihat dengê firrokan.

Herdu çavên keçikê, tiji hêstir, bel bû bûn û hindik mabûn ji kortikên xwe der-kevin, zimanê wê yê biçûk niv bihustekê kişiya bû, rûyê wê qermîçî bû û devê bavê wê gilêzeke gewravîn bi ser porê wê de dirijiya. Bavikê can dabû, lê hê ji mêjiyê wî hemî wezifeyên xwe rane-westandibûn, hê ji wî dixwazt keça xwe biparêze, lê ji dest nedihat der, û ji ber ku ji dest nedihat der dixwazt biqire, lê nikaribû, dixwazt hezar naleyî li cihanê wîne, lê ziman nedifertili, dixwazt tufe rûyên karbidestan ke, dixwazt xwe bi bûka xwe gihîne, dixwazt xêtir ji dayika xwe bixwaze, dixwazt careke din li dorhêlên xwe binihêre û çavên xwe ji welatê xwe tiji bike, dixwazt li pêşmergeyan wesiyeta xwe bike, dixwazt li nîfsê nû şiretan bike, dixwazt û dix-



wazt û dixwazt, lê dil rawes-
tiya bû, nema oxicên digi-
hişte mêji û hêdi hêdi xwe
wenda kir û ber xwe bi
tevahi wenda bike spasiya
xwedê kir, bê ku bizanibe
çima, kat tunebû ji xwe
bipirse, ew pirsê yeke kûr
bû, dûr û dirêj bû.

Ji ev kesê bēnav ne dūr,
hebûn bi hezaran wek wî.
Helebçeya bi jinê şên şî
niskva ve bû bû goristan.

U navê Helebçe çend
rojan hêstirên jan û bêça-
retiyê ji çavên hinan rijandin.
Kurdan li hin bajarên Ewropa
tevdêrên meşan kirin û li
gellek şûnan li ser avêtina
sloganan serên hev êsandin.
Li Londerê li ser rakirina ala
Kurdistanê şer ji
derket. Kurdan li hevûdin
xistin, polisên inglîz bi wan
keniyan û ala Kurdistanê bi
zorê bi destên Kurdan ji dest
Kurdekî hat xistin. "Ez ne
katî ev al e," hat gotin. Li
hin şûnan Kurdên di meşê de
ji hevûdin veqetiyên, hinan
bang dikirin: "bimre Sed-
dam," û hinan: "bimre
Xumênî."

U Kurdan belavokên xwe

disa belav kirin û partiyan
navên xwe li binê kaxezan
xistin. U helbestvanan hel-
best nivisandin û di kovareke
Kurdekan de hat nivisandin:
JI PRAG TA WASINGTON
BUYERA HALABCE HAT
PROTESTO KIRIN !!! Erê ji
Prag !!! U li vir û wir çend
hukmatan fedok û şermok
bikarhanina çekên kimawî
istinkar kirin. Bikarhanina
çekên qedexê, ne kujtina
Kurdan !!! Erê, şora rast
divêt were kirin. Li şûnekê,
yan duduyan pencereke bal-
yozxaneyê Iraqê hat
şikandin.

Lê hawar, ey Kurdekan,
hawar ! Kî dikare çiroka ew
merovê bēnav û keça wî ya
sê salî, hema çirokekê ji
yên bi hezaran, tēxê peyvok-
an ? Kî dizane çî raman di
mêjiyê wî re derbas bûn, kî
dikare xwe berde nav derya
hest û jana dilê wî, kî dizane
di ew çend saniyeyên ber

mirinê de çî û çî di mêjiyê yê
dimirê de derbas dibin, çawa
hemî rojên jiyana yekî, xwe-
diyên wî, hevalên wî, evîna
wî weqa beza di ber çavên
wî re dibezin; kesek nikare !
Tu kes ti caran nikare, ne

nerxê mirina wan bide, ne
xwûna wan sax ke û ne ji
daxwaza dilên yên hatinî
kujtin bi cih bike. Kesek
nikare qurçifandina jiyana
zarokên Helebçe û yên hemî
warên Kurdistanê carek din
bi hev xîne, kesek nikare
dilên xort û keçên evindar
yên hatinî kujtin bi hev
gihîne, kesek nikare dest û
giyanên jin û mêrên hevûdin
têr neditibûn nêzîke hev ke,
kesek nikare hesreta di dilên
pir û kalên di zikê niv
deqekê de mirinî honik bike
û ji dest kesekî nayê der ew
merovên li ber dilên hinên
ku sax manî weqa şêrîn û
giran car din li wan veqerîne;
û çivik û lawir û kulilkên
welêt,...

Helebçe ne destpêk û ne
dawiya bêtirên li serên Kur-
dan e. Heye ku rojekê disa
peymanên "bratîyê" ji car din
werin îmze kirin, heye ku ji
cangorên me re pûtekî birha-
nînê ji li meydana bajêr
çêkin, lê canên şehîdên ne-
tewa me aşiti û rihetiyê
nabînin, ta ew roja ku têde
Kurd digihên radeyekê, ku
nema hêzek dikare bêtirên
wisa disa û disa wine serên
neteweyêke ji hev belav û
bêçare.

(VII-88)

N ê ç î r (2)

Osman Sebrî (*)

Di hejmara Ronahiyê a Îbân da min bendek li ser nêçirê, nêçira ko di welatê me da dibe, nivîsi bû. Ji ber ko bend pir dirêj bû bû, min hin nêçir serpilki nivîsin û nêçira teyran ji hêlek hîştî bû. Herwekî di dawîya bendê da min ji xwandevarên Ronahiyê ra goti bû, ev e ez awayê xwedî kirin û daxistina teyrên nêçirê ji bi bendeke xweser berpeyî wan dikim.

Yek ji di benda berî vê da min nêçira kêvroşkan yekcar serpilki nivîsi bû. Ji ber ko her kes agahî vê nêçira han e, min ne xwasti bû bi dirêjkirina wê xwandevarên delal kiz bikim. Lê pasê, xwediyê Ronahiyê di vi warî da gazind li min kir. Li ser daxwaza wî jî, di dawîya bendê da ezê careke din vegerim ser nêçira kêvroşkan.

Xwedîkirin û daxistina teyran

Di benda berî vê da me goti bû ko dema teyran bi torê digirin, her du çavên wan didirûn. Qesda wan jî çavdirûtinê, ji bo heya hîni dengê mirov bûne ko netirsin. Piştî ko teyr çavdirûti û pergirêdayî digehê destê nêçirvanê xwe; berî her tiştî jê ra sê tîştan pêk tîne :

1- **Kostek**, ji çermeki nerm û delal têtê çêkirin ko dikeve her du lingên teyr û ji bo pê girtinê dûvîkek pê va ye. Ev **dûvik** jî bo pê girtina nêçirvan e. Di serê dûvik da **xelekek** heye ko **benekî** xurt û sê-çar gazan dirêj ji pê va dikin.

2- **Venîstek**, ji sê daran têtê çêkirin ko wekî kursiyekê ye. Ci gava kostek êxistin lingên teyr, li ser venîstekê datînin û benê bi kostekê va bi venîstekê va girêdidin; da ko nefire.



3- **Lepik**, ev jî ji çermeki xurt têtê çêkirin, da ko nêçirvan têtê destê xwe û teyr rake ser. Ji ber ko rojê du-sê caran gerandina teyr divê, bê lepike rakirina wî ne mîkûn e; di roja pêsin da pêkanîna lepike hewce ye.

Piştî ko ev her sê tiştên han pêk hatin, **deh rojan-**

teyr çavdirûti dimine û rojê du-sê caran têtê gerandin. Rojê du caran jî jê ra **gostê mîrîşkan** têtê dayin; lê bi şertê ko têtê nebe. Di roja pêsin da heya ko qenc dadikeve nêçirê, têtê kirina têtê ne dirist e. Teyr çiqas qels û jar bikeve, ewçend zû dadikeve nêçirê. Teyrê xurt û qelew, kêr caran dadikevin nêçirê û pir caran di çaxa daxistinê da direvin.

Gava roja dehan hat, çavên teyr di nav komek peya da vedikin. Ji ber ko di vê demê da hîni deng û pêjna mirovan bûye, nema ditirse û hovîtiyan şanî dide. Ji vê bi şûn da, wî hîni **seyên nêçirê** dikin. Edî çî gava bibin gerê, divê se ji bi nêçirvan ra bin.

Heftekê jî ko holê derbas bû, benê bi kostekê va bi qasî bist gazan dirêj dikin. Edî jî wê rojê pê va nema wekî berê **gost** tavêjin nav lingên wî. Divê nêçirvan dûrî venîstekê bisekine û **gost** raveyî bike û "hay" ke. Bi haykirinê ra li nêçirvan dinêre û **gost** dibîne. Hînga bi firekê ra li ser destê nêçirvan vedine û **gost** dixwe.

Piştî ko deh rojên xwe jî holê derbas kirin û hînekî çêtir aşîne bû, bi navê "**gurê**" benekî du sed sê sed gaz dirêj çêdikin ko daketina

teyr hingê dest pê dike. Gava dixwazin teyr li ser gurê berdin, divê li nava gund bi derkevin û herin ciheki dûz. Vê carê li gûna lepikêkê dudu divên. Ji ber ko her seriyekî gurê mirovek pê digire, wê gavê, benê ko bi xeleka kostekê va vedikin û serê gurê di nava xelekê ra derbas dikin.

Dema mirovê hember hay dike, teyr bervê dinire, goşt di dêst da dibine û difire diçe goşt. Bi vî awayî her du mirovên ko bi seriyên gurê girti, her yek çar pênc caran gaziye dike û piştî ko du nikul goşt bide, ê mayî jê didize. Ev kira han her roj du caran di demên tastê û şiva teyr da çêdibin.

Roja pêşin li ser gurê, car caran teyr revê dixwaze. Lê gava nikare xwe ji gurê xilas bike, êdî revê ji bir dike û dixwaze zikê xwe holê têr bike. Ciqasa roj bi nav da terin teyr ewçend asine û hin dibe. Bi vê rêzika han kîjan teyrê çetin be, di bîst rojan da li ser gurê fêr dibe. Ci gava di firinê da têr xwe berda biniya gurê; hinga nêçirvan bawer dibe ko teyrê wî kedi bûye. Ji vê xwe berdana teyr a bin gurê ye ko bi hinkirina teyr a nêçirê ra daxistin dibêjin. Anê da-ketina teyr a bin gurê.

Ci gava teyr qenc di bin gurê ra firî, sê-çar rojan ji dişa du mirov, lê bê gur, wî hay dikin û şiv û tasteya wî didinê. Paşê hinga dikarin bibin nêçirê.

Tûle-bûna teyran

Her sal di çilê Havînê da teyrên nêçirê pûrta xwe

diweşinin ko bi vê ra "tûle" dibêjin. Tûle-bûn niziki sê mehan dûm dike. Cil rojên pêşin pûrtê diweşine û çil rojên dawiyê pûrt pê tê. Di vê midetê da, teyr pir qels bibe û hewceyî xizmetekî mezin e.


Di meha Biharê a dawiyê da divê nêçirvan di odeya ko dike teyr bi xwedi bike da hin qesil (hêşinayî) biçîne. Gava ket serê Havînê, pûrta teyr rengê xwe digihare, pirçazki dibe û dest bi weşinê dike. Hinga divê nêçirvan kostekê ji lingên teyr bi derxe û berde nava odê. Herwekî di hêleke odê da qesil heye; li du hêlên din yekê testek av û yekê ji hin axa paqij datinin û derî li ser dadidin. Rojê carê divê qesil bête avdan, ava testê bête giharîn û ax bête tevdan. Teyr ji her roj sê-çar caran di qesilê da diçêre, di testa avê da xwe dişo û di axê de vedigevize. Di vê mideta han da kêman caran ji teyr ra goşt

tê dayin. Piştî sê mehan pûrteke nuh pê tê û vedigere halê berê. Teyrê ko Havînê ev tiştên han jê ra pêk neyên, pûrta wî pir kirêt diweşe û kirêt hişin tê û nema bi kêrê nêçirê tê; ji ber ko perên wî xar û belovaca hişin tîn û bi kêrî firina xurt nayê.

Nêçirvanê teyrê nêçirê, her sê mehên xwe ên Havînê bi tevayî di xizmeta teyr da dibore. Ji bo vê ye ko her kes nikare wan bi xwedi bike û ên ko bi xwedi dikin ji jê ra xulamekî xweser digirin da ko dirêjiya salê pê mijûl bibe.

Nêçira kêvroşkan

Ji ber ko di benda berî vê da min nêçira kêvroşkan serpilki nivîsî bû; li ser daxwaza xwediyê Ronahiyê careke din em vegerin vî wari. Nêçira kêvroşkan bi tajiyan gelekî e xweş e. Ji



ber ko çar-pênc salan min ev nêçir kiriye, pir û hindik agahiya min jê heye.

En ko ev nêçir ne kiri bin, welê dizanin ko ev nêçir ne hewceyî zanînê ye. Bi tenê kêvroşk girtin karê **tajiyân** e. Lê a rast ew e ko di nêçira han da agahi û serwestiya nêçirvan du par û xurti û jêhatî bûna tajiyân pareke nêçirê ji xwe digire. Ew tajiye ko di destê nêçirvanekî nezan da rojê du kêvroşkan bikare bigire, teqez di destê nêçirvanê serwest da pênc-şes heban digire. Zanin û serwestiya nêçirvan di warên han da ye.

1- Beri her tiştî **cihê** ko kêvroşk tê da vedisire çak nas dike û berî ko birinê taji bişkê jê ra kêvroşk radike.

2- **Merasê** xwes digire; da ko kêvroşk dûr baz nedin. Kêvroşkên ko dûr baz din pir caran li pêş tajiyân wenda dibin.

3- Kêvroşkê xurt an qels (1) ji **cihê** wî dizane û tajiye xwe bera ê xurt nade.

4- Heke ji tajiye pirtir bi nêçirvan ra hebin, yekî li **bilindcihan** dihêle. Ji ber ko her du lingên kêvroşkan ên pêşin ji ên paşin pir kintir in, her dem çavê wî li bilindcihan e; çima ko li ber kaşan pir xurt direve. Gava nêçirvan tajiyeke xwe li gazê dihêle, heya kêvroşk digehê gazê qenc diweste. Hinga ew tajiye vehêsi bi gengazi nêçira xwe digire.

Di vê nêçira han da awayê xwedikirina tajiyân ji hewceyî hinek zanîn, an bala xwe danê ye. Ev xwedikirina han ji bi pêkanina çar tiştan dibe :

1- **Xwarin**, di heftê da qe ne çar caran şirani û çar caran ji avsir (ji rûn an ava goşt û nan û sirê çêdibe) dayin.

2- Ji bo **nermhistina pişt** taji cileke berkulav û germ li piştê sidandin.


3- Heftê du caran pişt taji bi **ava germ û sawûnê** şûstin û qenc mistdan.

4- Ji bo parastina birinê taji, her gav **girêdayî** histin.

Ji bo vê ye ko her **pênc mehên** nêçirê (mehek paiz, sê meh zivistan û mehek bihar) nêçirvanê serwest tajiye xwe girêdayî dihêle. Bi tenê rojê sê caran digerine.

Awayê nêçirê

Nêçira kêvroşkan bi tajiyân; awayê çaktir, bi girtina merasê dibe. **Meras**, di **rex hev ra meşina nêçirvanan** ra, tê gotin. Dema nêçirvan degehên **cihê nêçirê**, weki kevanekî an hiva nuh **nivgovendekê digirin û di erdê bi guman da diçin û tên**. Di pêş û rex xwe da çi hij, dirî û tûpên ko bibinin kevir dikan. Divê navbera her du peyan sê-çar gaz hebin. Gava fireyiya navbera peyan ji vê pirtir be, pir mikûn e ko kêvroşk ranebe.



Heke taji yek be, meras ji li goreyî wê kin tê girtin û taji dixin nêveka merasê. Na gava taji dudu bin, her yekî didin hêleke merasê. Heke taji ji duduyan pirtir bin ên mayî diêxin nêveka merasê. Lê her hal tajiye qenc didin peran û ên qels diêxin nêvekê. Merasa ko çak bête girtin, tê da kêvroşk dûr nareve. Heke kêvroşk dûr nereve, tajiye çak di niv kilometrê û hin hindiktir da digire.

Kêvroşk ko bi çavpehni û teresiyê hatine nasîn, carcaran ranabin. Qewimiye ko nêçirvan pê li serê wî kiriye û di bin lingê xwe da girtiye. Ji bo vê di girtina merasê da divê nêçirvan gelekî serwest be ko kêvroşk bi şûn xwe da nehêle û jê derbas nebe.

Sowa (cîns) tajiyan

Sowa tajiyan ji wek ên hespan gelek in; lê ne bi nav û binyat in. Ji bo naskirinê, sowa hespan bi navê xwe diyên ko li cem hatine nasîn; lê ji bona tajiyan tişteki holê

(1) Kêvroşkên qiracan, nemaze ên ko di ber kaşên bi çeqeq da bi cih dibin gelekî e beza û xurt in. Ev celeb kevrosk e piştîşin in. Kevroskên kepir û çiyân ne ewçend e xurt in û sorik dibin.

ne fikirine. Bi tenê, ên ko taji pir bi xwedi kirine diza-nin; an bir dibin ko wek hespan, an mina seyên mayi tajiyan ji sowên wan ji hev cida ne. Herwekî me li jor gotî, çima ko ji her sowekê ra navek ne hatiye xweya kirin, di vir da emê nikari bin sowên wan ji hev veqetinin. Lê di vî warî da di destê me da delilek heye ko ji tajiyan çak cewrên çak, ji ên bêkêr jî cewrên bêkêr dadikevin.-

Ji bona zanina çakiya tajiyan çend nişan hene ko nêçirvan tajiye çak ji ê bêkêr bi der diêxe.

Seri : tajiye çak bêvildirêj û qoçê sêrî tûj û bilind dibe.

Pisîr : pisîra fere û daketi nişana xurtî revê ye.

Pîst : kijan taji mûfirkên piştê zêdetir bin ewçend beza dibe.

Bi van nişanên han ji nêçirvanekî ra mîkûn e ko tajiye jêhati ji ê bêkêr bina-se. Piştî ko me benda xwe hinde dirêj kir, heke me xwandevan hinekî serwest kiri bin ew ji baş e.

Dawî

Stran

Hacê-Hac

Cemîla Celîl (*)

Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, Hacê-Hac,
Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, can, wey, can.

Zêr li sêrî bû t'acê, Hacê-Hac,
Zêr li sêrî bû t'acê, can, wey, can.

Wextê lawka zewacê, Hacê-Hac,
Wextê lawka zewacê, can, wey, can.

Karê xezala cotin, Hacê-Hac,
Karê xezala cotin, wey, can.

Nêç'irvan melkemotin, Hacê-Hac,
Nêç'irvan melkemotin, ca, wey, can.

Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, Hacê-Hac,
Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, can, wey, can.

Karê xezala bi sêne, Hacê-Hac,
Karê xezala bi sêne, can, wey, can.

Berbi dangê xwe tene, Hacê-Hac,
Berbi dangê xwe tene, can, wey, can.

Nêç'irvane malêne, Hacê-Hac,
Nêç'irvane malêne, can, wey, can.

(*) Kilam û Miqamêd Cimeta Kurda, Roja Nû, 3, Stockholm 1982.

X e b a t a m e

4 Heziran

Nêziki sed rêxistinên çandî bi hev re rojekê li Botanique, navenda Wezareta çandê ya fransîzî, li Brükselê pêk ani. Di bernama vê roja mezin de Kurd jî cih stand. Koma Nîstîman, ku ji Arnhem - Hollanda hati bû, dilanên kurdi yê gelek xwes û geş pêşkes kirin û endamêk ji Têkoşer bi kurtî li ser rewşa Kurdistanê peyivî. Li derve jî me pirtûk û belgên kurdi raxistin.

5 Heziran

Festivala Folklorî ya Fumal, gundekî nêzîkî Namur, ji aliyê Navenda Candi ya Fumal pêk bû. Cardin koma Nîstîman dilanên kurdi kirin.

11 Heziran

Rêxistina Wereldwinkel niv-rojekê ji bo gelên bindest li Ypres pêk ani. Em bi raxistina pirtûk û belgên kurdi beşdar bûn.

22 Heziran

Em beşdar bûn civina çapê ya Tevger (Tevgera Rizgariya Kurdistan). Ev eniya nuh ji van heşt rêxistinên Kurdistanê Tirkîyê pêk hatiye : Ala Rizgarî, Kuk-Se, Parhêz, Pdk-Rn, Ppkk, Pskt, SK, YSK. Nûnerên wê amanc û bernama xwe dan nasîn. Gelek rojnamevan beşdarî vê civinê bûn û rojnameyên tirkî li ser wê nivîsi.

1 Tirmeh

Civina çapê ya grûpa Alliance Libre Européenne, ya Parlemanta Ewropa, li ser Kurdistan û Eritrê li Brükselê (li rûpel binêre). Ji derveyî Têkoşer, rêxistinên her çar perçeyên Kurdistanê jî hati bûn vexwendin (dawet kirin), lê bitenê Tevger û P.D.K. Iranê hati bûn. Willy Kuypers, nûnerê vê grûpê, li ser Peymana Sêvr ya 1920, ku mafê serxwebûnê da bû Kurdan, rawestîya û wê weka bingeheke huqûqî jî bo xebateke Parlemanta Ewropa li ser Kurdistanê hesiband.

29 Tirmeh

Festivala Navnetewî ya Folklorê "Gala des Nationalités" ji aliyê rêxistina Asso-

ciation Internationale pour la Défense des Langues et Cultures Menacées, li Liège pêk bû. Têkoşer bi koma xwe ya dilanên kurdi beşdarî wê bû. Zargotina (folklor) kurdi bala nêrevanan gelek kişand û dilê wan şah kir.

8 Ilon

Em beşdar bûn xwepêşandana (meşîn) ku ji aliyê Eniya Kurdistanê Iraqê, li ber avahiya O.N.U. (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, hat pêk anîn. Ev protesto di televizyon û rojnameyên flamanî de hat weşandin.

Weşan

Me nivisareke dirêj li ser Halabca di kovara Mxax-Information, N° 51, hejmara Heziranê, de nivîsi.



A.I.D.L.C.M.
Association internationale
pour la Défense des Langues et Cultures
menacées

GALA DES NATIONALITES

ANCIENNE EGLISE SAINT ANDRE
20 HEURES
place du Marché à Liège

Têkoşer'den haberler



4 Haziran

Yüze yakın örgüt, Fransız Kültür Merkezi Botanique (Brüksel'de), kültürel bir gün düzenlediler. Programda Kürtler de vardı. Têkoşer'den bir arkadaşın Kürdistan hakkında verdiği öz bir açıklama ile beraber Hollanda-Arnhem'den gelen Koma Nîstîman Folklor Ekibi seyircilere birbirinden güzel oyunlar sergiledi. Dışarıda da informasyon sergimiz vardı.

5 Haziran

Namura yakın Fumal Folklor Festivali. Fumal Kültür Merkezi tarafından düzenlenen festivale yine Koma Nîstîman Folklor Ekibi Kürdistan'ın her tarafından oyunları ile katıldı.

11 Haziran

Wereldwinkel örgütü ezilen halklar için yarım gün düzenledi. Ypres'te düzenlenen bu güne biz informasyon sergimiz ile katıldık.

22 Haziran

Tevger (Tevgera Rizgarîya Kurdistan) basın konferansına katıldık. Bu yeni cephe şu örgütler tarafından kurulmuştur : Ala Rizgarî, KUK-SE, Parhêz, PDK-RN, PPKK, PSKT, SK, YSK. Cephe adına konuşmacılar program ve amaçlarını açıkladılar. Gaztecilerin çoğunlukla katıldığı bu konferansa Türk gazeteleri geniş yer verdi.

1 Temmuz

Avrupa Parlamentosu Alliance Libre Européenne grubunun Kürdistan ve Eritre (sayfa... bak) üzerine toplantısı. Têkoşer'in yanında Kürdistan'ın dört parçasından örgütler bu toplantıya davet edilmisti. Fakat yalnız Tevger ve PDK-İran katılmışlardı. Bu grubun üyesi Willy Kuypers, 1920 Sevr anlaşması ve o anlaşmanın Kürtlere vaat ettiği ulusal hakları açıkladı, bu anlaşmayıda bugünkü mücadelede temel

hak olması gereğini ve bu anlaşmanın da Avrupa Parlamentosu tarafından çalışmalarının çerçevesine alınmasını talep etti.

29 Temmuz

Uluslararası Folklor Festivali "Gala des Nationalités". Association Internationale Pour la Défense des Langues et Cultures Menacées tarafından bu festival düzenlendi. Têkoşer bu festivale Kürt halk oyunlarını oynayan Folklor ekibi ile katıldı. Folklor ekibi seyircilerin beğenisini kazandı.

8 Eylül

Beşikda Irak Kürdistanı Cephesi tarafından Birleşmiş Milletler binası önünde Irak'ta Kürt Halkına karşı girişilen toplumsal kıyım hareketi protesto edildi. Bilindiği gibi Irak Kürdistanında kimyasal silahlar kullanılmakta ve yüzbinin üzerinde Kürt kadını, çocuğu ve ihtiyarları sınırlara hücum edip sığınma hakkı istemektedir. Bu gösteri Beşikda Televizyonu, Flamanca bölümünde çıktı.

Yayınlarımız

MRAK-Information dergisinde Halabca ile ilgili uzun bir yazı yayınladık.-

